


%100  
KURDÎ

# pîne

PIŞTÎ ŞER MÊRXAS GELEK INI..

KOVARA QERFÎ Û WÊJEYÎ



kovara qerfî û wêjeyî ya nîv mehî 1-15 ekim (kewçêr) 2000 Sayî: 23 500.000 TL

YNK TEVÎ HEMÛ  
BANGÊN AŞTIYÊ  
DEV JI ŞERÊ  
NAVXWEYÎ Û  
ENQEREYÊ  
BERNEDA!..



YEAA!  
HEYRAN!  
ME DIGOT,  
WÊ LI VEGERA  
ENQEREYÊ ERÎŞ  
BIKIN.. LÊ EVQAS  
JÎ NABE!..





## NİFİRÊN POSTMODERNI!

Xuyaye canê we pir dixure, ji ber ku ji name û gotinên we diyar dibê ku hûn bengî û şewitîyê nifiran in!.. Hûn her tim dibêjin, "Ka tu nema nifiran dinivîsi!" Îca piştî vê yekê, min xwe ranegirt. Ji bo salvegera Pîneyê, wekî promosyon, van nifiran diyarî we dikim!.. Li we bigivirin... Noşî can bel!..

- Daweta we bêkom li dar kevel!.. (Îca rebenê endamê komên NÇM her kesî dijewicînin, lê ew nikarin ji Komara Demokratîk fêde bigirin: Kar îsterem... Kar!.. Li ku ma heq û adalet!..)

- Kî Pîneyê nestîne, bila destê ciwanên HADEP'ê an jî welatparêz biguvehêl!.. (Malnemîrraatno!.. Mirov nawêre bêje, "hûn bi xêr hatine". Tu dibêje qey kincan diguvehêsin an jî şîrikê cebar in!.. Dema hûn çûn Hadepe ji dûr ve bêjin, "rojbaş!..")

- Molotofa te neteqel!.. (Heft xwezî bi wan rojan!.. Hop!.. Heval sûrece uysana!..)

- Keça te bi polês re bizewice! (Mala we xira bû!..)

- Bavê te bibe şofêrê IETT'ê!.. (Stenbolî dikarin pê bikenin!.. Hûn zorê nedin xwe!..)

- "Uygulama" li te biqewime!.. (Hawar eel!.. Heval ez karim cixareyê nekşînim û salekê firaqên qawîşê bişom!..)

- Navbera te û qomîncî xira bel!.. (Ev nifira Evdîlqedîr Çîçek el!.. Rebeno kişandiyel!..)

- Tu bêpîvaz bimîn!.. (Îca pê girt!.. Çem û çem çû!..)

- Chata te bêheval derbas bibel!..

- Chatmîrato, kontûrmîrato!..

- Porkuro (Êdî keç û jin porê xwe dirêj nakin kul!..)

- Tu bêtelefona destan bimîn!.. (Hûnê ji qehran bimirin. Ji ber ku hûnê çawa qarîzma û bayê xwe bilind bikin!.. Ji birçîna dimirin, lê telefona destan distînin: Qûna tazî tembûrê dixwazî!..)

- Tu her tim li dawiya govendê bî!.. (Bavo her kes bûye sergovend!..)

- Kevoka aştiyê bi diyarê welatê we nekevel!.. (Tu dibê qey berê ketiyel!.. Em bûn kêl!..)

- Tu çaya tirkî vexwî (Qesem bi navê xwedê qizilqurt û kureder jê çêtir el!..)

- Tu bibî mewanê Reha Muhtar!.. (Herin xwe bikujin!..)

- Virûslêketo (Çavê min bi sedan virûs hene, çî zanim kîjan el!..)

- Satorsuz qalasin oxlim!.. Baba'nin son qasetîni dînlmeyesin!.. Ayaqqabinin panîsî qirilmaya qebrax!.. Leşsiz qalasin!.. Dawan senî terk edel!.. (Silav û hurmet Qirix û pêxwasên hêjal!.. Xançepek mala me ye! Cihê bav û kalê me ye!..)

- Meytê (term) te belediye hilîne (Bibe para gur û hirçan çêtir el!..)

- Qanalfasyona we biteqel!.. (Heya ku belediye were, hûnê bichehimin!..)

- Talabanî hevkar û şîrikê te bel!.. (Ma hewce ye em êskere bikin!..)

- Bêwîze mayol!.. (Bi taybetî ji başûriyan bipirsîn!)

- Civînê we zêdetir bin!.. (Ji xebatkarên saziyan bipirsîn!.. Tişteki din nakin jixwe!..)

- Tu konsera Ciwan Haco û Şivan ya Amedê nebîn!..

(Xwedê Ciwan wê li Amedê winda bibe! Tirkî nizane ku)

- Bêwiagra mayol!.. Bêsiqorat mayol!..

- Yarê yarê hîpermetrop bûye, mîyop bûye, ma tu nabînî, lenseke bistînel!..

\*\*

Xwedê ez qala xelata İtalyan nakim. (Ma wê bidana kê?) Pere nedan ku, ma ezê çima bikim!.. Em birçî ne Heyvasor birçî!..

## RİZO - DİZO



İMAM CİCİ

## DOZO


BİRECAN



\* GIZGIROMAN.

\* GEÇİCİ KÖRLÜK.


## CI-VAJO!?! PÊVAJO HEYRAN PÊVAJO!.. min dîsa fêhm nekir CiVAJO!?!





Serokomarê Tirkîyê Ahmet Nejet Sezer biryarnameyeke din li serokwezîrîyê vegerandi..

ŞER Û TÊKOŞÎNA NAVNETEWYÎ YA LI DJÎ GLOBALÎZM Û KAPÎTLÎZMÊ XURT DIBE!..



Tirkiye di warê belengazî û xizaniyê de Somali û Mozambîk li pey xwe hişt!..

**ŞER**



LI BATMANÊ ENCAMA KOÇBERKIRINÊ Û ŞER: XWEKUŞTIN DIL Û KEZABAN DIŞEWITÎNE!..



**Teqoçî?**

Heya sala di 2001'ê wê her tişt sererast bibê!..  
Wezîrê Dewletê Rûstû Kazîm Yucelen


Şirketa telefona destan a Tirkîyê Turkcellê îhaleya Başûrê Kurdistanê qezenc kir. Lê ji bo destûrê li hêviya wezaretê karê derve ye!..



Saddam Huseyn kenê guran tîne: Îca bi xwîna xwe Quranî Kerîm da nivîsandin!..







**NAMEYEK JI MIRINÊ RE!..**

MURAD BATGI

muratbatgi@hotmail.com

Ji bo kesên ku dixwazin birayên xwe ji welatê xwe bi dûr bixin û ji bo kesên ku bi xwîna birayên xwe dixwazin, jiyana xwe bidomînin.

Ezê bi carakê çavên xwe bi destê birayê xwe birêjim, ku ez tenê carekê, lê ew tu car nebîne.

Ezê bi carekê, zimanê xwe bi destê birayê xwe jêkim û lal bim, ku ez tenê carekê lê ew heta hetayê nepeyive.

Ezê bi carekê dest û lîngan bi birayê xwe bidim jêkirin, ku ez tenê carekê, lê ew tu carî nîkaribe ji cihê xwe bilive.

Ezê bi carekê xwîna xwe bi destê birayê xwe bidime rijandin, ku ez tenê carekê, lê ew her tim bêxwîn, lê di nav xwînê de bimîne.

Ezê bi carekê bi destê birayê xwe ji welatê xwe veqetim, ku ez tenê carekê, lê ev her tim ji welêt bi dûr bikeve û welêt biterikîne.

Ezê bi carekê xwe bi destê birayê xwe bidime kuştin, ku ez tenê carekê, lê ew hezar caran bimire. Ji ber wê niha dixwazim bi destê birayê xwe bême kuştin.

Bila ew min bîkujê. Belkî klaman jî bêje li ser min û belkî li ser min bigirî jî. Ev zortir e ji kuştinê.

Jiyana mirov Hz. Yusiv û vir ve çiqas dirêj be jî dîsa kurt e. Gelo mirov, ji ber ku jiyana wî têrê nake dikare çav berde jiyana birayê xwe? Mirov divê carekê hîn îxanetê nebe! Mirov divê carekê xwîna ku bi îxanetê nehatiye rijandin nebîne! Çawa parçeyek laşê me parçeyê din qebûl nake? Çawa destên mirov ji lîngên mirov aciz dibe?

Roj bê, ezê dest û lîngên xwe jêkim, çavên xwe derxînim, mêjî belav bikim û li odeya birayê xwe raxim ku bi rehetî bîkaribe razê. Dema razê, bila lîngê min an jî destê min hembêz bike. Dema serê xwe li ser balîfa xwe vergerîne, çavê minê rijiyayî li hember xwe bibîne. Di nav xwarîna xwe de bila mêjiyê min ê belavkirî bibîne.

**'Ger hebûna me jî birayek...  
Û bi lefêdanek  
Ku bihata zemanek  
Û em pê bibûna xwedî rûbarek...'**

Belkî sînorek heye di navbera me de. Û belkî ew sînor bi meşa çend saetan diqede.

Lê di nav dilan de, di nav êş û keseran de, ne sînor hene û ne jî meşa ku bi çend saet û çend salan diqede. Wê kî me rizgar bike ji vê dûrbûna dil û hestên birayan? Dîsa divê em vê çarîna E. Xanî şîrove bikin.

**"Herçî kê bi şûrê destê hîmeta birayek  
Zeptkir ji xwe re bi nemêrî dewletek  
Bê ceng û cîdal û bê tehewwir  
Bila vê rizgariyê û vê şixulê qet mekim  
tesewwir..."**





**AQILÊ XALTIYA MIN Û DEWLETI..**

Rehma Xwedê li miriyê we û yên haziran bel.. Rehmetiya xaltîka min, gava çû rehmetê nod û çar salî bû.

Di ciwaniya xwe de, mîna karxezalekê bûye: Porê hinekirî, dikir çil gulî û berdida nava piştî xwe. Gava dimeşiya kulîmekên wê (kalça) û morîkên şînbirîkên serê gulîyan-bi hevdu re dans dikirin. Xizemên poz, guharên guhan, bazînen zendan giş zivîn bûn.

Di biçûkahiya wê de, diya wê, deqek şîr li ser lêva wê ya sor û yek ji li eniya wê dabû çêkirin. Gor dibêjin, pesnê xweşikbûyîna wê nedihat dayîn..

Dengbêjan kilam davêtin ser cemala wê ya şîrîn, ribaçiyên ji xwe xweş, rîtma hezandîna hêt û pêsrên wê bi melodiya ribabê dianîn zimên.

Xaltîk, çiqas bedew û çeleng bûya, ew qasî jî fetan bû. Ji berhevdana mêran pir hez dikir. Ewîlî xortên gund, paşê gundên derdorê li ser wê bi hev ketin. Sê caran zewicî. Mêrê wê yê ewîlî jî ji rûyê wê mêrek kuşt; çû ket hepsê li wir mir. Yê duyemîn bi dostikê xwe da kuştin. Dostikê wê pê re zewicî, ew jî bi merezê ket, mir. Ji her mêrekî pênc-şes law û keçên wê çê bûbûn.

Piştî nod saliya xwe êdî ew xurîfî bû. Ne wê dizanî ku we çî digot û ne jî tu kes bi dû peyvên wê diket.


Rojekê, ji malê satilekê didin destê wê ku here serê bîra gund û satilek av bîne. Bîr li derveyî gund e. Diçe satila xwe tijî av dike û bi çelqîn berê xwe dide malê. Li vegeêrê dibîne ku bûka malê nivînan dikşîne derve û diavêje ser dika pêşiya malê. Xaltîk meraq dike, dibêje "Keçê tu çima wisa dikî?" Bûka malê, ji xwe re henekekê dike, dibêje "Xaltîkê ezê êgir berdim nivînen xwe û bişewitînim!.."

Piştî bûka malê, dikeve hundirê malê, bi karê xwe de dikeve. Xaltîk, çend gavan dimeşe, diçe qûna xwe dide ser kevirê rûdinê. Roj dibe nîvro, nîvro diqulepe dibe esir... Bûka malê hê karê xwe dike.

Xaltîk nema debar dike, diçe cem bûka malê, dibêje "De qîzê tê beşewitînim, bişewitîne. Li malê li benda min in!.." Bûk şaş dimîne, dibêje, "Xaltîkê qurban, min ji xwe re henekek bi te kir. Ma tu hê li benda min î!.."

Kurdan ji dewletê re got "Em ne cudaxwaz in, em şer nawxazin, em 'mîsakî mîllî' nas dikin...". Dewletê got qey kurd dibêjin emê xwe bişewitînin û çûye qûna xwe daye ser kêvir!.. Aqilê dewletê ne ji yê xaltîka min a xurîfî pirtir e. Ewê pir bipê.

# ŞEKIRÊ QULQULÎ





ZEMBELAS



medenî  
ferho

## SERDANA ZATÎ-BATGÎ

Pêr bû, doh bû, îro bû gelo!.. Gelo roja Ord. Prof. Zati-Batgi ji nişka ve û edayeke maquliyê serok komarê dînan kete çixarekêşxaneyê televîzyona kurdî kîjan bû? Di dema ku ez bi Çekdar re li ser senaryoyên têr finansî ya Telegulê diaxivîm, Zati-Batgi hat û hat di ser serê min re ziq rawestiya!..

Zati-Batgi, bêyî eda xwe biguhere bi keleke sift şor û şemîti pîrsî: "Kuro genê te çend in?" Ya rastî min zanîbû ku Zati-Batgi Serokê Komarê Dînan e, lê min qet nizanîbû ku ew destebirakê Simayilê Dîn î Amudî ye. Bêtaqet bûm û bersiva min nebû. Dawî min hawara xwe gihande serokê rojnamegerên xwedî sertifiqayên sêwaxê Cahît Merwan.

Cahît Merwan hîna di nava xeyalên rojnameya xwerû kurdî û magazînê ditirxuland û digot: "Eger di manşetê de mirov binivîse: 'Helga, tirk bi nemêrî û mêşmirîti gunehkar kirin. Li Batmanê jî aşiqî kurdê ku nû dît bû.' Binêr hingî rojname çed hejmaran difroşel!.." Cahît Merwan peyre banzda cem Zati-Batgi, gotin di şikefta devê xwe de badan û got: "Mesele, spota bi qasî misasekê dirêj were nivîsandin û bêje: 'Genê Serokê Komara Dînan Zati-Batgi û Maradona yek in.'"

Zati-Batgi di nava mifsidiya pot-berhvkirinê de kenîya û li nava çavên min nihêrî. Min fêm kir ku ew hîna li benda bersiva min e. Ya rastî ez ji bo bersivê ne amade bûm. Torinê Emê Gozê ku di kozika kolanê de lingên xwe kirin merbetê, kilîda wê avête sebeta jarê û ez newêrim navê wî bêjim, tenê ez dikarim bêjim, her dem pesnê xwe bi koçerîya xwe dide û cihan teva bû bajarî Mazharê me hîna tûrikê bê mewjî ji ser milê xwe dananiye, dûrî min bû. Çameçar min bersiveke girover da.

— Genê min ew qas zêde ne ku bi şelpanî dirêj dibin, digihîn bîna Fîşqeya û bi ava mezin re diherikin, masiyan jî li ber xwe dibin.

Cahît dîsa got spoteke dîn: "Li gorî lêkolînên li ser genan hatiye kirin, diyar bû ku Pele û Maradona bi eslê xwe kurd in. Hingî wê ji 50 hezarî bêhtir bifiroşe. Yaaa birakoooo!.. Haaa hahaaaa!.."

Bi saya koteka ku Cahît li milê wî da, Profesor-sinus Ordinar-kosinus Zati-Batgi bi ser xwe ve hat. Mirçênî ji devê xwe anî û lê nêrî. "Biçirê caw cawê te ye..." Min zimanê xwe gez kir û di dilê xwe de sedûpencih-penc-şes caran nivêj kirin ku Cahît wateya van gotinan fêm nake. Baş bû ku Cahît hîna bi spotên rojnameya magazînê mijul bû. Gotin wekî bayê li ber guhan bikeve, firiyan çûn.

Dawiyê kesî tiştê ji kesî fêm nekir, em teva belav-wela bûn.

Tebîni: Nivîsa Mahmût Lewendî li ku ma em nizanin!..





LOZIN



Haydar IŞIK

KITAV

Kitav esto, însone ke weneno, tîj erzena zerê qafike, însone beno rewşenbîr. Coka dewlet kitavune niyanên ra tersena, qedexe kena.

Hitler, îktîdarê xo ke xurt kerd, verî kitavî veşnay. Berlin de kitavê nûstoxanê çepan û Jahudîyan çekerdî adir.

Wel hesil Paşa hona îktîdar nîamevi feqet lista kitavanê ke qedexe biyê rojnaman de nûsnayî. O wext keyeyê min de xeylê kitavê qedexey estîbî. Mi kitavê xo kerdî-paket berdî dibistanê xo de lozina kalorîferî de wedard (nimnay).

Usar (wesar) bi, hewa zaf germ bi. Mi hêna zana ke, kalorîfer heta zimistan nêveşeno. Ez yew roja payîz de şîyo ke kitavanê xo peyser biyarî, tewlo kitav şîne, veşne.

Xeyle hevalê mi serva kitavunê qedexan estî zîndan û înanrê îşkence kerd.

Îşkence min jî, veşnayîne kitavunê min biye. Rind yeno min vîr yew kitavê Jack London jî te de bi. Nika ez ke îta Bavyera de nûstoxanê Almanan rê na mesele ser qîsey bikerî, pêro hayret kenê û dewleta Tirk reqne kenê.

Paradoks de niyada ke, nika mamurê Bavyera kitavê min top kenê. Mi hên zanayê ke, welat o ke dîrokê xo de kitav amê veşnayîş û nika demokrasi, mafe mîrovan muhîm vînenê, uza kitav qedexe nêbenê.


Ma ke fek keme ra, vame dewleta Tirk gereke şîyore (bimano) dewletanê Ewropa. Kes nêzoneno ke Bavyera şîyaro Tirkiya. Paradoks awa ke îta kitav qedexe bîne û keyeyê nûstox ponc asmede di reye saye beno.

Tenya keyeyê min niyo, ney het buroye ÇAPXANE MEZOPOTAMYA saye kenê, uza kitavê min "ŞAFAĞI BEKLE-MEYECEĞİZ" top kenê.

Bêguman min wastê ke nûstoxê kurd û rêxistinê kurdan tenê veng vejê, alîkariye bidê, lê heta nika min nêdî û nêheşna.

Paradokse bîn jî no yo. Eke însone bêveng mend, dewlet eve keyfê xo şona.

# Xêzen Beredayî



EV AWAZEKE XATIRXWESTINÊ  
Xwendevanê/a hêjal.. Ev serê salekê ye em bi hev re ne; her çend carna me hev xapandibe be jî. Garaneke astengiyên min çêbûn, di vê demê de. Ji ber van astengiyan min nekarî, ez vî quncikî bibim serî. Loma min ev beş, ji bo sohbet û gotûbêja bi we re veqetand. Lê ez dêhn û bala didimê, zêde tiştêkî ku ez bêjim jî nemaye. Gule û berikên min qediyên. Bi qewla biyaniyan "kêfa min ji xatirxwestinê re nayê." Her tişt gelekî baş bû. Spasîbal..





# ELTEWIS

SEFER SEVI



KURO BERDÎN... BERDÎNÎ..EZÊ  
KARTOLÊN DIN JÎ BIQEŞÊRIM...  
ÊN MEZINTIR BIQEŞÊRIM

KURO MA MIROV JÊ YEKÎ RE  
HER ROJ NOBETA MITBAXÊ  
DINÎMISE, DAWIYÊ WÊ WISA BE...  
PISMAM LI MIN BINÊR!

KARTOL...  
PÎVAZ



TU BISE KEKÊ  
ŞEXMÛS. EZÊ  
BIDIMI..


NABE AZADO, BERÊ JÎ  
TE DABÛ, ÎCA EZÊ  
BIDIMI..

Hes...hes...  
hes...ap!



QEY TILIYA TE TÊ DE  
MA?!..

KILIK!



KURO QET FIKIRÎ,  
EM ÇIMA DIBEZIN  
VAN MIROVAN? MA  
JI MIRÎŞKA ME RE  
GOTINE KIŞI..

HIŞ DENGÊ XWE NEKEI.. EV  
GOTINÊN TALÛKE NEI.. TU  
ŞORBAYA XWE VENAXWÎ,  
MA NE BES E?

SUSMA-SUST  
SIRA SANA GELE



## GIRARA QEREĞIYAN

### GIRARA ŞANOYA KURDÎ

Di Festîwala Şanoya Kurdî ya Duyem de, çêkirina girarê bûbû para komîta nixandîne: Ji bo temaşevan û beşdar birçî û destvala venegerin malên xwe, piştî çar rojên tijî huner, hema bi dist, tencere, sênîk û beroşan girar û xelat belavkirin; û ji vê girarê tu kes, tev min jî, bêpar nema.

Lê ji bo ev encam zelal bibe, ezê hinekî li ser karê yekî ji endamên komîteyê bisekinim û emê nav lê bikin "Memet."

Memet, dema xwarinê berî her kesî çentê wî li ba dibû û dibezîya. Her ku mêvan diçûn ji bo xwarinê Memet ji cihê xwarinê vedigeriya.

Derhêner xwe re anîbû wî jî pir xwes hem hunerm tenik bû. Dig xelata ne ya er lê ya başti Memet digot komîteyê yê soranî fêm nê soran bi kum Ji ber vê em pêşkêşkirî bi dinirxînin."

Ji ber vê y baştirîn deq (Enton Tîxof mêrik ji zû de hema Şores Tîxofê minî dêvla wî ve x Dibe heta komîteyê bib ya Şores Qa

## TABLÊTÊN

ABÊ, WELLEH, BELA KU TU  
QRALÊ MIN Î NABÊJIM, LÊ  
BILA DIYA MIN BIBE JINA  
MIN, LI ERDÛ EZMANÊ TU  
CAMÊR Û OTORÎTEYÊM MÎNA  
TE NÎN IN!..



Esref



reça xwe bi  
fîwalê; keça  
û. Memet jî  
û hem dil-  
Divê ev  
rîn derhên-  
ezûr bel!"  
valên  
manc bi  
û yên  
fî fêm nakin.  
oyên  
kî

î xelata  
jî para  
lê ji ber ku  
miriye,  
dir kirasê  
e kir û ji  
t wergirt.  
a endamên  
ew nivîsar  
jî. Ev jî

normal e, ji ber ku nivîsar bi soranî bû. Jixwe eger bi rûsî bûya, wê ya Tşîxof bûya. Piştre jî dilê wan hilnedida, yekî mirî aciz bikin û ji Rûsyayê bînin û xelatê bidinê. Hema komîtê qenc û xweş kir. Dinya jî ev e: Hinek dikin û hinek girarê dixwin.

A kambaxtir jî ku heta berî belavkirina xelatan bi rojekê, komîtêyê nizanibû ka Koma Teatra Jiyana Nû bi kîjan şanoyê beşdar e û digotin "TA" neketiye warê nirxandinê.

Lê roja din nizanim çî bi serê endamên vê komîtêya feqîr de hat, çî xwarin, çî vexwarin, ez nizanim, lê tiştê ez zanim ew e ku komîte di navbera xelatan û cilên şûştî de şaş bûbû û ji hemûyan werê ku TA wekî têlê dirêj e. Lewma hema hemû cilên şûştî an hemû xelat, bi Ta ve daliqandin.

Her wiha Ta jî neqetiya û beroşa girarê bi ser serê şanogerên din de rîjîya û Tayê bi qirika Memet girt.


BEREDAYÎ

DE BICEHIME QÛNEKÊ ALEMÊ!...  
QEY EZ NIZANIM DERDÊ TE ÇI YE?  
QÎZA XWE BIDIM TE Û TU JÎ PEHÎNÊ  
LI QÛNA MIN BIXÎ!.. MA EZ BI  
VAN QEŞMERIYAN DIXAPIM!..  
KURO MIROV NAWÊRE, PIŞTA XWE  
BIDE QEBRAXÊN MÎNA WE!..  
ELÎGULÊ, EZÊ WE TILIYA TE  
BIXIM DIYA TE!..



# VILQ!.....

İMAM CICI





# EZING

Çsref  
MUMCU



AX PIŞO ABÊ AXX!.. BI MIRINA XWE, TE DIL Û HINAVÊ ME HELANDIN... TU QET JI BÎRA ME NAÇE!.. EY ŞERAXBURÊ MEZIN Û NEMIR, ŞINA TE HER DI DILÊ ME DE YE!.. NOŞ... NOŞ!..



ZÛ BÊJE!.. TU PKK'CI AN JÎ HIZBULLAHI YÎ!.. ZÛ!.. AN NA EZÊ ÎMANA TE DERXIM!..

POLÊS ABÊ, BI HEZAR QURANÎ EZ NE PKK'CI NE JÎ HIZBULLAHI ME!.. EZ MÛSLÛMCI... MÛSLÛMCI ME!.. KU TU BAWER NAKÎ, LI XERÎTEYA SINGÛ MILÊ MIN BINER!... XWEZÎ EZ JI "BABA" ÇEND STRANAN BÊJIM!..



HEVAL, VA YE EZ RADIKEVIM!.. KU MIROVAN MAFÊN XWE STANDIN, DEMOKRASI Û AŞTÎ HATE SER HUKIM, MIN ŞIYAR BIKE!.. XWEDÊ EZ PIR WESTIYAME!..

ERRIK... ÎCA EV JI ME KÊM BÛ!.. RAKEVIN, BIXWIN, BIRIN..... HEYRAN. EZ DÛSA VEDIGERIM QULÊ DIYA XWE!.. WIHA NAMEŞE!.. EZÊ BI ÇOLAN BIKEVIM!..

JÎ PSÏKOLOGÊ WE MEHMÛT QÛNTAZÎ 3 DERMANÊ STRESÊ

- 1- ŞERM NEKIN, TIRÊ XWE YÊ BI DENG, DI NAV CIVÎN DE BERDIN. STRES-MITRES NAMÎNE (MIN JÎ BÊHEMÎ XWE TECRÛBE KIR. GELEKÎ BAŞ BÛ.)
- 2- JI YARA XWE RE NÎV KÎLO TRÎ, 50 GRAM PENÎR BIKIRIN. (ÊDÎ CHÊ XWARINÊ HÛN BELÎRLEMÎŞ BIKIN)
- 3- JI DERVE PSÏKEKÊ BIQEFÊLIN BIBIN MALÊ. MIST DIN Û JÊ HEZ BIKIN. LÊ JI SATANÎSTAAN DÛR BIHÊLIN.



GELÎ KURDÊN STENBOLÎ!.. ME JI DIYARBEKIRÊ, JI BO ŞER KEVIR ANÎN, BER DESTÊ WE! KEVIRÊ VIR BEREDAYÎ NE!..


ABÊ TE BAŞ BÎR BIRIYE!.. WELLEH EZ BAWER NAKIM, LI VIR, ŞERHIŞKÊN KU VAN KEVIRAN BIKIRIN, HEBIN!



BAVÛO!.. EZ TÊM PIYÊ TE, XWE BI DAR VE NEKÎ!.. MA EZÊ BÊ BAV ÇAWA BIKIM!.. MIN SÊWÎ NEHÊLE!..

KER KURÊ KERA!.. MIN BERDE, EZ POŞMAN BÛM!.. ORISPÎ ÇOCIXÎ... EXX... POŞMAN... POŞ... EXX... POŞŞ... PO...





ÇERMESORÉ GENI! TUNÉ BIPEYINI!  
ANNA EZÉ HEMÜ DIRANÉ TE JÊKIMI!



KURO RED!..  
DALTON JI HEPSE  
REVIYANE!..

ÇET.. ÇOT..  
ÇUT!..



BILA BE! JIXWE EYJÇÜ  
REHMETÉ! EMÉ BÊJIN  
MEDYAYÉ 'JI NERDIVANÉ  
KETI!..



DE EM HERIN DILDIL!  
EM PEŞIN BIÇIN  
CEM PAŞA!..

BISE!..  
EZ PIKTUKA  
XWE  
BIQEDINIM

K KIZIKDERILI.



# RED (KESK) KÎT



LAWO ÇO EZ BIRÇI ME!  
MA EM ÇIMA MIDÜR  
NAXWIN!..

ÇO EM LI HEPSE  
REHET SÛN! MA EM  
ÇIMA REVIYAN!..

ME MIDÜR  
REVAND! VA YE  
BIKËRÏ ÇOTÉ!..

QUZILQURT!..  
ÇEY  
EM TIŞTEKÏ DIFIKIRIN!




VA YE EM GIHÎŞTIN  
NAVÇEYÉ!.. A PIŞTÏ VÊ ŞUXLÊ  
ZAROKANÉ!.. VA YE DEMA  
TOLHILDANÉ HAT!..



MIDÜRÉ DELAL, JI BO ALÏ-  
KARÏ Û XIZMETA ZOR SPAS!  
EZ TE AZAD DIKIM!  
DE BIMEŞ....

TEQ!



HER TIM LI VIR  
ÇERMESOREK  
HEBÛ!?!..



ÇERMESORO!.. KU TU MIN  
BIBÏ CEM HOZA XWE, EZÉ  
ŞEKIRÉ QULQULÏ BIDIM TE!..

\*KABILE.



ROŞBAŞ RED!.. KEREM KE  
RÛNE!.. TU JÏ PÊ ZANÏ, MIN  
JI BO DALTONAN GAZÏ TE  
KIRÏ.. EDÏ, EM BI VAN  
CAMËRËN KU BERÉ JI BO  
WELËT KAR KIRIN, NIKARIN!



EW CAMËRËN KU, ME BERÉ  
JI BO QIRKIRINA ÇERMESORAN  
DIXEBITAND, EDÏ JI ME RE  
NE HEWCE NE!.. TU HEVALÊ  
ME YÊ DILSOZ TÏ.. MEYTÊ  
VAN CEŞÛ ZIKREŞAN BÏNE!



DIBE KU DALTON HERIN,  
JI ÇERMESORAN RE ÇALA  
OPERASYONA ME YA BIHARË  
BIKIN!.. DE ŞËRË MIN BERÏ  
KU BIGIHËJIN WÏR, WAN  
QÏR BIKE!..

SERÇAVAN!  
EZBENÏ!  
ÇET  
XEM  
NEKE!..



LÊ ÇAXÊ KU TU VEGERÏ,  
EM LI SER GUHËN ÇER-  
MESORAN, ÊN KU TE  
JÊKIRINE, BIPEYININI!..  
ÇET, 'TE DU GUH  
JÊKIRINE Û ZÊDE PERE  
STANDÏNE!..





MEDYA LI VIR NÏNE!..  
EZË BI TËRA XWE  
GUHË ÇERMESORAN  
JË KIM!..

ÇEP...  
ÇEP...

REQEDA  
RUQEDA!



LI DIYARËN PIR DÛR GUNDEK!

WEYLË, JI DÛR VE TOTE MEKÏ  
PËNC SERI TË! MANÏTÛYË  
TEALA ME BISITIRÏNE!..



KURO RABIN SER XWE!..  
XERÏB KETINE HOZË!..  
MA HÛN GËT BÛNË!..



ROJBAŞ KEKË! ÇAR XALO  
DIXWAZIN BI TË RE BIPEYIVIN!..  
BI XWEDË GELEKÏ KOMÏK IN,  
BI TAYBETÏ YË DIKËJ!..

BIRAYË GERENÏMO  
TU BI XËR  
HATÏ!..



KEREM KIN HEVALNO,  
EM HERIN NAVÀ  
KON!..

KEKË MEWZÛ  
HINEKÏ TAYBETE,  
LEWÏMA  
EM LI HUNDIR  
BIPEYIVIN!..



EZ, JI BER TIŞTËN KU MEI BERË  
LI DIŞT WË KIRÏVE, FEDÏKAR IM!..  
DEWÏLETË EM XEBITANDIN, LË  
PAŞË BERA ME DAI.. REÏSË  
HËJA, EM DIXWAZIM BI WË RE  
LI HEV BËN!..

XWE  
TAZÏ  
BIKE!..



EZBENÏ, QËY  
WE ŞAŞTËM  
KIRÏ!..  
AŞTÏ!.. EFÛ!..

XWE  
TAZÏ  
BIKE!..



KURO CO, EM NIHA KEŞË  
SPT NE AN ÇERMESORIN!

TËKUTANO!  
SIMBËLA MIN  
JÏ ÇÛ!..

NEQEHIRE  
CO!.. KU ME  
RED KÏT KUŞT,  
TE REHET  
BIBÏ!..

HÏRR!.. HER TIŞT  
JÏ BELA WÏ YE!..  
KU NIHA LI VIR  
BÛYA, BÛBÛ  
KEBAB!..



EZ LI VIR IM CO!.. NELIV!..  
HÛNË HESABË VË ÎXANETË  
BIDIN DEWÏLETË  
WELATFIROŞNO!..



ZINQ!..







VAYË BËBAVË KU BANË  
MIN BI ÎŞKENCEYË KUŞT!..  
MELKEMOTË HERAM!..  
ËDÏ EZ BIMRÏM JÏ NE  
XEM E!..

RAU!..

DAWÏ





## ZIXURÊN ŞEVÊ



### EHMED HUSEYÎ

**TIZBÎ**  
 Wek wê tizbiya ku bavê min ji sîsikên zeytûnan bi dar vedikir.  
 Ez dê ji te re,  
 Aniha, li ber çavên şevê  
 Çend peyvên tarî bi dar vekim

**DEM**  
 Min dixwest herikîna bêbext a demê  
 Di navbera lêvên xwe û te de Rawestînim.  
 Tu bi gazinên xwe  
 Bi poşmaniya xwe  
 Demê reşbîn dikî.

**BARAN**  
 Piyala gumana min bi ser keviyên memikên te de Dirijiya.  
 Tê xwe dida alf  
 Lê ewrê velîstinê di sînga te de dihejiya.

**BERBISK**  
 Gula ku min ji gulistana riha Cizîrî ji boyî berbiska te, vedizî  
 Gula ku xunava wê ji miska bişirîna te didexisî  
 Di nav şarezaiya destê te de  
 Di nav xirecira hestê te de bû kevir.

**ÊŞ**  
 De bixwaze ey pinpinîka min:  
 Rengê gulê?  
 Bîhna gulê?  
 Dengê gulê?  
 Tîna gulê?  
 Na.. Na, keskesora kulê!

**ZEVÎ**  
 Wê nermeyê  
 Ji nav lêvên xwe berde  
 Zeviyên ku min ji boyî pêşwaziya te bi alal û zersonanan çandine  
 Dê bîhna gulava te ji bîr bikin.

**BÎR**  
 Tê bîra te  
 Wexta ku termê hişê me  
 Bi ava biratiyê dişustî!  
 Tê bîra te  
 Wexta ku laşê bîra me  
 Bi reşçariyê dayikan radipêçan!  
 Tê bîra te  
 Wexta ku darbista nasnameya me di goristana zaroktiyê de vedîştan!

**PEYV**  
 Min bi destê te digirt  
 Pêl dişkestin û sîber dikeniyên  
 Min bi bînahiya çavê te digirt

Peyv dilikumû û hîvê kirasê xwe diçirand.  
 Min her tişt ji te re digot:  
 Raz û nehênîyên helbesta xwe  
 Stranên kevna û lofînên xwe  
 Xetîreyên xwîna xwe û rêçên mirinê  
 Dilbijandinên hetav û sefer û xatirxwestinê.  
 Lê min peyva dawîn  
 Ji boyî firîştîyan dihişt  
 Ji boyî ku bikaribim stranê av bidim.  
 Ji boyî ku bikaribim roavahiya dilê te ya  
 Dijwar û tawanbar, bipesinînim.

**CEGER**  
 (Di tarîka şeva hicran  
 Çiraxek sîfet im ya reb  
 Ji ser heta piyan ar e  
 Bi carek vêketim ya reb."Cegerxwîn")

Wer bîlîlo da silavên min  
 xerîbî bigihîne dilberê  
 Wer ez bi rê kim ey hevalo  
 dengê dil û bawerê  
 Hingivê nal û girînê ez  
 dimêjim dem bi dem  
 Tu bi xwedê kî qet nehêle  
 wê xezalê bo seqem  
 Wer bilbil!  
 Fîxana te ji kevir dipijiqe  
 Evîna te di katjimêrên kevirîna de asê dibe  
 kulîlkên kûvî yên bîrîna te  
 li ser keviran xilmaş dibin.  
 Û ez jî, serpêhatiya firîna te  
 Bi zimanê keviran  
 di hişê dastanbêjan de dikolim.

**PASVANÎ**  
 Ji bo çî bişkojên hinarkên te  
 Bê xatirxwestin dimirin  
 Ji bo çî daristanên matmayînên te  
 Bê xatirxwestin dişewitîn  
 Ji bo çî tu pasvaniya gyanê min  
 Bo dudiliya xwe napejirînî.

**HÊJAYÎ**  
 Tu hêja yî  
 Tu gul î lê tu sertaca gula yî.  
 Tu hêja yî  
 Tu dil î lê xencera hemî dila yî.  
 Tu hêja yî  
 Tu kul î lê şewimenda kula yî.  
 Tu hêja yî  
 Tu mil î lê tu tolgirtina Kawa yî.  
 Tu hêja yî  
 Tu kil î lê tu wêran û rijîna çava yî.  
 Tu hêja yî  
 Tu şilî lê tu xwedaya ewrên zuha yî.  
 Tu hêja yî  
 Tu bilbil î lê tu helbestvana ker û lala yî.  
 Tu hêja yî  
 Di sînga min de, tu rojçêbûna baran û ba yî.



# KA PERE LI KU YE XWEDÊNEHIŞTNO!..

Qesem bi navê xwedê, ev îtalyanî dixwazin navbera me û dewleta tirk xera bikin! Jixwe ne xweş e û ji bo vê kovar û rojnameyên me her hefte qedexa dike. Me mecbûr dike ku em her hefte bi navekî nû kovar û rojnameyan derxin.

Jixwe em wisa jî dikin; dewlet qedexa dike em jî derdixin. Êdî em wisa dikin ku dewlet bi me re nagihêje: Kovar û rojnameya ku me berî vê bi sê hefteyan derxistiyê hîn nû qedexa dike.

Yanî bi me re nagihêjin û ji bo vê yekê Emniyeta Amedê 21'ê mehê gazî xebatkarê me yê Amedê Suat Ozalp kir û hem ji bo xelata ku hevalên îtalyanî daye me, em pîroz kiriye û hem jî qedexeya SATOR-TIME ragihandiye heval û jê re gotiye, "Ne ji me bûya, Pîneyê nikaribû xelata navneteweyî ya îtalya bistîne. Bila hevalên we ji me re dia bikin!.."

Lê wan ji bîr kiriye, ku Pîneçî jî tunebin wê nikaribin meşa xwe heq bikin. Bila be. Dev jê berdin, em werin ser meseleya esasî.


Hempîşeyên me yê îtalî, (li gorî dewletê jî dijminê tirkanê sondxwarî) Dîno Frusillo çawa dibihîze Pîneçî li hemberî OHAL'ê ketine nav şerekî dijwar, ji bo ku peyvira xwe ya esasî pêk bîne, dest bi xebatê dike û rewşa Pîneyê dibe civîna Federasyona Rojnamegerên Îtalî û ji wan dixwaze ku Xelata Hîcwa Polîtîk bidin Pîneyê.

Rojnamegerên Îtalî yê ku dixwazin navbera me bi dewletê xera bikin, bêyî ku bifikirin pêşniyara Dîno qebûl dikin û ew jî vê yekê ji Lîjneya jurî re pêşniyar dikin. Tu dibêjî qey Lîjneya Jurîyê jî wekî Dîno dijminê tirkanê sondxwarî ye, bêyî ku bifikirin xelata hîcwa polîtîk didin Pîneyê.

Peyre wan telefonî me kir û gotin, "Me xelat daye we, werin xelata xwe bistînin." Bi rastî dema ku me bihîst em gelekî kêfxweş bûn. Ji ber ku ji aliyê aborî

ve em ketin tengasiyê û em nikarin pereyê hevalan bidin, lewre hindik maye ku xebatkar dest bi grewê bikin.

Ku hevalên Îtalî wê rojê telefon nekiribûya, di heman rojê de xebatkar wê biketina grewê. Çawa ku standina xelatê bihîst ketin nav ços û heyecanekê û grew ji bîr kir û gotin, "Xelat xelateke bi pereyê û çawa be wê pere were!..



Hewce nake em dest bi grewê bikin."

Heta xebatkar ketin rêzê û hinekan gotin, "Heval ji kerema xwe re çend meaşên me pêşîn bide." Me jî got, "temam heval xem nekin. Emê meaşên we yê salane pêşîn bidin!.."

Me amedekariya xwe kir. Bi rastî heta ku me bawilekî mezin peyda kir, îmana me çikiya. Lê dawiyê de me peyda kir û me bo wîzeyê serî li Balyozxaneyê Îtalyayê da. Dema ku me serî li Balyozxaneyê da, me got qey ne Balyozxaneyê Îtalyayê ye Şaxê OHAL'ê ye. Belge û melgeyê ku ji me nexwest neman. Ji nimreya solan bigirin heta mûyê porê her tişt xwestin.

Belê hefteyekî bi me lîstin û di dawiyê de gotin, "Hûn kurd in û ji bo ku kurd ji

bo penaberiyê têne Îtalyayê, em li ser we lêkolîneke hûrbînî çêdikin. Lewma divê 15-20 rojan bisekinin."

Li gorî gotina wan ne mimkûn bû ku em bigihêjin merasîma xelatê. Me jî hevalên li Îtalyayê agahdar kir û Îtalya tevlihev bû. Li aliyekî hevalên me yê Îtalyayê gotin helwesta balyozxaneyê ji bo kurdan heqeret e, li aliyê din

Federasyona Rojnamegerên Îtalyayê dibêjin ev helwesta balyozxaneyê bo federasyona wan heqeret e. Kurterê, Îtalya tevlihev dibe, Wezaretê Karê Derve dikeve nav van nîqaşan û êvara 19' meha rezberê (yanî berî roja merasîmê) ji Konsolxaneyê Îtalyayê ya li Stenbolê re dibêje, "Hûn çî dikin bikin, wî zîlamî bigihînin merasîma xelatdayinê."

Seat 14'an de Balyozxane tê girtin û ev nîqaş li dora saet 17'an diqewime. Balyozxaneyê Îtalyayê li seat 17.30 de telefonî me kir û got, "Belayê serê me. zû werin balyozxaneyê!.." Dema em çûn gilî û gazincên xwe anîn zimên û digotin, "Ev çî afat û bêtar e, we kurdan aniye serê me. Ma li ku derê li seatê de wîzeyê hatiye dayin!.."

Bi vî awayî bi heft kul û heft derdan em gihîştin bajarê Forte Dei Marmi. Lê bêyî em hinekî bêhna xwe berdin û kincê xwe biguherînin, bi bayê bezê em birin cihê merasîmê. Her çiqas me xwe çirand jî û got, "Em hinekî bisekinin!.." Rêbera me Hêvî ku bi xwe "siyasî ablava" me ya li Îtalyayê ye got, "Heval ev talîmat e, em diçin salonê." Me jî ji neçariyê riya salona merasîmê girt. ( Di vê navê de di trêne de min bi talîmatê goştê berazan jî xwar!..)

Çawa ku em gihîştin salonê, me hîn bêhna xwe bemedabû, merasîma xelatdayinê dest pê kir. Merasîmê wan jî ne

wekî yê me ne. Merasîm di nîv seatê de bi dawî bû. Pêşkêşvan ez wisa dame nasîn ku ji gotinên diyar bû ku, ew dixwazin navbera me bi dewletê xera bikin. Gotin, "Her çiqas mudirê Pîne niha di nav me be jî, dibe ku dewleta tirk niha malbata wî girtibe binçav."

Bi rastî çawa ku min got ne wisa ye madê wan tîrş bû û hindik mabû xelatê paş ve bistînin. Dibe ku li ser van gotinên min pere nedan û tenê plaket dan. Baş bû ku tê demexistin min ew bawûl ev qas mezin ji bo pereyan bi xwe re aniye.

Piştî merasîmê em çûn xwarinê; te digot qey fûara makarnaya ne. Berê masî û makarnaya gilover, paşê gungilî (kivırcık), kurtebirî navê hemûyan nizanîm, lê 9 cure makarna bi me dane xwarin. Em neheqiyê li wan nekin, lê şaraba wan hindik mabû ku min serxwêş bike. Baş bû ku siyasî abla tiştê negot. Ji ber ku ew bi xwe jî şirika min bû!..

Roja din em vegeyriyan Romayê. Li Romayê de me dît ku hempîşeyên me (li gor dewletê jî dijminê tirkanê sondxwarî) Dino Frusillo dîsa li ser kar e. Vê carê jî ji bo kurdên penaber yê ku ji kampîna hatibûn avêtin dest bi çalakiyan kiribû. Dîno, bêhenek, bi çar telefonan bi çar deverên cûda re diaxivî, da ku ev pirsgerêka kurdên penaber were çareser kirin.

Bi rastî Dîno wekî navê xwe dîn e û îmana wî ji dewleta tirk diçe. Ku we helwesta Dîno ya li kampa komînîstan de bidîta, ez bawer im hûnê jî bigihêjin vê baweriyê. Tiştên ku dewleta tirk heta niha aniye ser komînîstan, yeko yeko anîn zimên û komînîstên îtalî jî, bi dirûşmeyên xwe, dewlet şermezar kirin.


Ku meseleya cih tunebûya û îmana we ji nivîsên dirêj neçûya, minê hinekî din dirêj bikira. Lê jixwe em bi îmana we li ser piyan e, lewma em naxwazin ew jî ji destê me here û bêîman bimînin.

## Ji Weşanên Welat bixwazin

**Amed**  
Kıbrıs Cad. Türk Hava Kurumu Apt.  
Kat 4. Tel: 412 223 34 83  
**Wan**  
Belediye İş Merkezi  
Kat 1. D 106  
Tel: 0432 215 64 26  
**Batman**  
Yeni Mah. 711.Sok.  
No: 27 Kat 2  
Tel: 0 535 319 46 15  
**Riha**  
Kunduracılar Pazarı. Özpolat İşhanı. Kat 3/5  
Tel: 0414 216 81 07

**Edene**  
Kocavezir Mah.  
Karacaoglan Cad.  
Aziz Pamukçu İş Merkezi  
Kat 3. No: 23  
Tel: 322 351 42 78  
**İzmir**  
1420 Sok. Koyuncular  
Apt. No. 12. Kat 5.D.5  
Kahramanlar  
Tel: 232 446 19 50  
**Mersin**  
Çankaya Mah. 4709 Sok. Eser İşhanı Kat I.D. 5  
Tel: (0324) 237 66 49

**Kerem  
kin, li  
axaftina  
Serok û  
Sokrates  
guhdarî  
bikin!..**



**DERKET**

### Kovara panzderojî (Onbeşgünlük Dergi)

■ Xwedî (İmtiyaz Sahibi) **M. Nuri Karakoyun**  
■ Lijneya Weşanê (Yayın Kurulu):  
**Mazlûm Doğan, Doğan Güznel, İmam Cici**

■ Berpirsiyarê Karê Nivîsaran  
■ (Yazı İşleri Müdürü) **Abdürrahmân Pekedis**  
■ Navîşan (Yönetim Yeri) **İstiklal Cad. Ayhan Işık sokak.19/1 Beyoğlu/ İstanbul**

■ Tel: (212) 292 72 70  
■ Fax: (212) 251 95 85  
■ E-Mail: [pinedank@hotmail.com](mailto:pinedank@hotmail.com)  
■ Kargerî (İdare) (212) 251 79 37

■ Çapxane: **Aspaş Matbaacılık**  
■ Yayın Koordinasyon  
**Ada Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd.Şti.**  
■ Belavkirin **BİRYAY Dağıtım**

■ Nûnergeh: Edene: (322) 351 42 78  
■ İzmir: (232) 446 19 50 Mersin: (324) 237 66 49





## BEQ Ên destê sibê hatine dinyê



Rast, çep, amade bin!! Di hilbijartî-nên nû de hûnê bibin serokbeledî-ye (tîmîmî...). Piştî pîrozî û mîzda-nan, li gorî Pîvanên Pîneyê hûnê bernamêyê têkuz ava bikin. Pêşî hûnê NQM'ê "kardeş sazi" îlan bi-kin. (Yetkililere duyurulur!!!) Dû re hûnê ji Koçer û Dêmanîyan lijneya Om-budsmanan saz bikin û nexweşî û pîrsîgîrêkên gel di-çih de çareser bikin.

## QUSXANE Ên berî nîvro...



Çavê me û yê pîrika we ronî!!! Piştî "yogun surecê û dîrsek temasîyan", Pîne kete yek saîya xwe, lê pis-mam û dotmamê wê Zirpîne, Ker-mêş, Sator...çûn çem û çem. Diranê wê yê şîr û mast derketin, lê bawer ke dikare qelî û penîr ji bix-we. (Ordular ilk hedefiniz hafalîk derg!!!) Hûn dibêjin em eşîr û malmezî in, lê qene we kîlo-yek danînok an jî pîroznameyê jî neşand. (Ez bawer im karê we yê neteweyî hebû!!!)

## MOZ Ên piştî dana pez



Gelî heval û pêvajonasno!, Ji we re mîz-gîniya xêrê!!! Xelata Pîneyê ya vir û derewan em didin we. Bi rastî jî we ev xelat heq kir. Sozên ku hûn nayînin çih, wekî wezareta karê derve û mîna sîfkonên Banû Alikan, her dem belayê serê we ne. Hevalên we ji kul û derdên we re penixîn. Evîndara we li deşta Mîşarê bû pûş. Dê û bavê we ji we re nîfirên nû di-afîrînin, lê dîsa jî ne xema hacetê we ye.

## CASIK Ên ber êvarê...



Hûn navê zarokên xwe datînin "Şilan, Şevîn, Rênas, Egt..." lê hûn jî wan re bi tirkî "qonîmiş" di-bin. (Eferim ji dirûtiya we re!) Hûn jî her kesî re propaganda kurdûnê dikin û çand û hunera kurdî jî hûn wekî hebûna xwe dibînin, lê wekî muxtarê gundê me, hûn li ber ava pîvaza mezin dibin. Li xwe muqate bin, ji ber salvegera Pî-neyê, ajan û mîlîsên me li her deverê digerin, ger ku li rastî we bêt, "aganîgi, naganîgi"

## ZIRNE Ên nivê şevê...



Ey welatparêzên babegît!!! Havîna ku bê hûnê herin Şîmexê û dil bi-kevin keçeke nazenîn. Piştî hûnê fêh bikin ku evîndara we keça qorîciyekî ye. Li ser pêvajoya dawî, genên mirovan û xerakîna Dî-warê Berîne hûnê guftûgoyên dûve dirêj bikin û dawiyê hûnê bi ser bikevin. Evîna we wê bibe sedema aştiyê û malbata wê jî, dê dev qorîciyê ji berde.

## HUDHUK Ên heft mehî hatine...



Hûn xwendin û zanistiyê ji hevalên xwe re wekî çekêkê bi kar tînin. Hûn pêşeroj û pêşketina xwe di nav gotînen Ecevit de digerin. Guherîna û hemdemî bo we pê-lav û kincên nû ne. Hûn xwe ji ser sed û bîst û çar hezar pêxem-beran re dibînin. Ji ber weswese û kompleksan, têkiliya we bi hevalên we re hatiye birîn. Hûn jî her tiştî re rexneyêkê dibînin. Pozê we jî tiştêkî neşewite. (Em we pîroz dikin heval!!!)

Hawar... hawar... hawar!...

## KUNDIR LI ENIYA ŞER E!

Nûçegîhanê rojnameya we Kundir, ji bo we çû eniya şerê Belûcîstanê û ji wir weşana zindî kir. Deng û reng û dengên ku kamera, teyp, guh, dil, çav, gurçîk, kezêb, mê-jî û destê me qeyd kir, ji we re pêşkêş dike:

- Êrîş kin şêrên min, ez mamê we me! (tep.. rep.. seq..)

- Lêxin heval, hucûm!.. (şeq.. rek.. teq..)

- Bişewitînin, wan ji vir derxin (tir.. vir.. hir..)

- Berfîdin, berfîdin, bisotînin xayinan (gir.. hir.. sir) Piştî demekê:

- Kaka ma ne eyb e ji me re. Em tev biran el.

- Ê heval me gotibû hûn çima êrîşî me dikin.

- Dijmin me berî hev didel..

- Emperyalîzm, sîyonîzm, surrealîzm, kubîzm, filanîzm, bêvanîzm...

- Ê we jî elokên me xwaribûn?

- We jî bizina me dizibû.

- We jî sîh sal berê ava me şêlû kiribû.

- Em sîh sal berê tunebûn!..

- Em wek we hebûn.

- Binê çî dibêje!..

- Haya we ji we hebel!..

Dîsa:


- Hucûm...

- Lêxin... (tep û rep)

Belê Kundirên heja şer bi wî awayî 200 salan didome.

### Belqitî li Eskeriyê

Belqitî çûye leşkeriyê. Dema manewraya ye. Memedo-



kê me di dest de tîfing di sengerê de xwe dirêj kiriye. Femandar Timûrê Leng hatiye:

- Dijmin ji pêş ve were tuyê çî bikî Heval Belqitî? Bel-qitî bersivandiye. Timûrê Leng dîsa pîrsiye, dijmin ji vî alî, ji wî alî, ji pêr re, ji par re were tuyê çî bikî? Belqitî ew jî bersivandiye. Femandar di dawiyê de:

- Lê dijmin ji hewayê were tuyê çî bikî?

Belqitî edî aciz bûye:

- Ma ji bilî min leşkerên vê komarê tunene qey? (Ma çima tirk ordîsî hepsî bendir qomûtan!..)



- Şerê navxweyî jî tiraliyê çêtir e. Qehremanên Netewî

- Ji bo ku em bidin hizbên kurdan û ew jî bi hev kevin, ji bo tîfing, bêrik, dendik, çendik û dolarên sexte me îhale vekiriye. Muxaberat, îstîxbarat û îtlaat

- Hêzên kurdan navê me jî herimand û rekora me jî destên me stand. Em wan protesto dikin. Talîbanên Afganî

- Ez hizbên kurdan protesto dikim û di pûsûlaya xwe de bakur û başûr îptal dikim. Mûcîdê pûsûlayê

- Kuro brakujno!.. Min neynin wir ha... Heci Qadirê Koyî

- Li bo her turfî şer û pevçûn nabênçîtî tê kirin, lê berpir-siyariya encamê em nagirin ser milê xwe. KNK

- Ez li benda demokrasiya tirkî im. Godot

- Em jî. Yekîtiya Ewropayê

- Weleh em jî. Nivîskarên Ozgur Politîka û Yenî Gundemê

- Hûnê hê pir li bendê bin birako!.. Bulent Ecevit û Dewlet Bahçelî

- Her çesit proje û xeyalên tirkî têne qebûlîkirin. HADEP

- Romana min a nuh 1600 rûpel e. Kî bîstîne, ezê di ser de kamyonetekê jî bidim. Medenî Ferho

- Min dîsketa pirtûka xwe ya 1700 rûpelî wînda kir. Mahmût Onder

- Bi bernamêya Elo Cîmşîd re tu têkiliya min nîn e. Mahmût Onder

- Ji bo bi pêvajoya nuh ve bi aheng be, ezê "sora" bernamêya xwe bikim kesk. Matadorê Netewî Cahit Merwan

- Ez kilama xwe ya "Şer Şer e" betal dikim. Hozan Şemdîn

- Min madalyona xwe wînda kir. Bêhukm e. Mehmet Uzun

- Fatê Patatê; êvarê li kadîne. Ekrem Kerênêr

- Demokrasi tiştêkî çawa bû? Em dixwazin çend metro bîstînin. Beşar Esad

- Mizdanvanên entellektuel ê nuh lazim in. Bertîl baş e. Hizbên Siyasî

- Perwerdehiya grûbên me yê nuh ên selaq didome. Rêxistina Mizdanvanan

- Ji bilî yê kurdan, bi her cure însîtûtiyê re hevkarî tê kirin. Înstîtûta Kurd li Paris

- Hemû kongre û mongre hatine îptalkirin. Yekîtiya Rojnamegerên Cahit Merwan

- Diranê min ê yekem derket. Ezê we gez kim. Amed Dagli

- Xesen û Xusen her sê jî qîzên pêxember in. Rewşenvir

- Heta ser hebe em sansor davêjin şer. Serokên kurd.




# pîne

REYTINGA PÎNEYÊ  
GIHÎST EZMANÊ HEF-  
TANI.. ÎCA ME LI  
ÎTALYAYÊ DI WARÊ  
HÎCWA POLÎTİK DE  
XELATA FORTE DEI  
MARMÎ WERGIRT. LÊ  
MIDURÊ PÎNEYÊ  
SEYÎT KARABAŞ KU BI  
HÊVIYA GERMKIRINA  
BÊRIKA XWE ÇÛBÛ  
ÎTALYAYÊ DESTVALA  
VEGERIYA!  
EM XWE DIAVÊJIN  
BEXTÊ WEI..



SALVEGERA  
PÎNEYÊ  
PÎROZ BE!..



NAÛET!..  
MA EM HATIN  
LI VIR MEQARNAYAN  
BIXWIN?..

